BUNDESPRÄSIDIALAMT

**Subject to change.**
**Translation of advance text.**

**Read the speech online:**
**[www.bundespraesident.de](http://www.bundespraesident.de)**

Berlin, 20/02/2023


**Serokê fidral Frank-Walter-Steinmeier**
**Li çalakiya bîranîna jiboyî qurbaniyên zemînheja li Turkiyê û Sûriyê**
**li 20ê Sibata 2023an rûda**
**li ber Dergehê Brandenburg li Berlînê**

eva bû nêzîkî du heftiyan, go wê zemînheja pirbihêz navça tixûb û sinûrê Tirkiyê û Sûriyê wêrankir. Dengûbasê ji bajarên wêranbûne tên, dihêlin hişê meriv bisekne û bêbawerîbe. Ew wênane di hişê mede çapbûn. Malwêraniya sedsalî!

Çi gotin nikarin wê wêraniyê wasfkin. Bêtir ji 45.000 kesî jiyana xwe ji destdan. Bi dehhezarên go bi jiyana xweve ji kavlê xanî û warê xwe rizgarbûn, birîndarê laş û derûnên e. Hêjî hijmareke nanas dibin kavilade windana. Û hêviya, wan zindî ji bin kavilan rizgarbikin gelek kême.

Gelek ji kesê zindî mane şok bûne û heyrî mane, nizanin wê çewa jiyan berdewambe. Nizanin wê sibê çewabe û çi çêbibe. Nizanin kî ji malbata wan hîna saxe.

Liher deverê go evê malwêranî lê rûdaye, mirov xemgînin û şîna mervê xwe dikin, şînê liser diya xwe û bavê xwe, liser keç û kurê xwe, liser xwişk û biryê xwe dikin. Li herdeverî meriv hene, ê mala xwe û hebûn û nebûna xwe windakirinm e. Hinek ji wan dibin çadir û konadene, hinjî li deverê arîkariya bilezde dijîn, hineke dinjî, hêjî libin ezmanê rût, liber serma dijwar dijîn. Bê av û bê elektrîk, bê cilê gerim û bê xwarin û vexwarin, herwiha bê arîkariya pizîşkî û tenduristî.

Xemgînî û şîn û heyîrîman gelek mezine û ew netenê li wir wihaya! Li vêderêjî li walatê mejî gelek kes dijîn, go meriv û hevalê xwe windakirine.

em îro êvarî tev li vir li Berlin hatina bahev, jiboyî bihevra bîranîna, qurbaniyên vê malwêraniya xopan û mezin, bikin.

Bundespräsidialamt
ADDRESS 11010 Berlin
TEL +49 30 2000-2021
FAX +49 30 1810200-2870
E-MAIL presse@bpra.bund.de
WEBSITE www.bundespraesident.de

Em bihevre yekin di bîranîna bêdenga liser miriyan. Em bihevre yekin di xemgînî û şîn û êşê de.

Hiş û gumanê me liba wan zindiyên li devera malwêraniyêne. Hiş û gumanê ma liba wene li Adana, li Dîlokê (Entabê/ Gazîantep) li Ruhê û li ûrfê. Herwiha liba wene li Malatiyê, li Maraşê li Idlib û li Helebê. Liba we hemiyan e, li Tirkiyê û li Sûriyê, liba wan kesên go hêvî û daxwazê wan dibin kavilade man.

Em ji were dibêjin: Em êş û jan û pêwîstiya we dibînin. Em guhdariya dengê hewarê we dikin. Em we bitenê nahêlin!

Îro êvarî hiş û gumanê me liba wan gelek mirovê welatê mede ye jî, ê meriv û hevalê wan li Tirkiyê û li Sûriyê  hene. Hiş û gumanê me liba hemû jin û zilaman, ên li vir, li Berlin û li hijmareke mezin li bajar û gund û bajarokê Alimanya ne, ê go divan rojê bihurîde bihêvî bûn û bi xembûn, duwa dikirin û digirîn. Hemû jî bêsûdbû!

Ez divêm îro ji we hemûwa re bêjim: Gelek kes li welatê me, beşdarî û pişkdariya êş û xemgîniya we dikin. Êşa we, êşa meye.

Eva tragodiyeke! Wêne û rapor, devûçav û dengê ji devera zemînhejê gihişta gelek mirova liseranserî cîhanê û hesta wan hejand. Nexasima li welatê me, em pêleke amadekariya arîkariyê dibînin, dihêle ez spasiyê bikim.

Tîmên rizgarkirinê ji Almany, li wê deverê, meriva ji bin axê derdixin û rizgardikin, birîndara tîmardikin û mirya bigor û binax dikin. Gelek kes (jin û zilamê) xwebexş û bêberamber arîkariya tîmê rizgariyê dikin di xebata wande. Hinek xweser çûne devera malwêraniyê jiboyî bi destê xwe di kavilade arîkarbin. Li hemû deverê welatê me, mirov arîkariyê komdikin û transporta arîkariyê rêdixin- çi li Kîta (baxçê zarokan) be, çi jî li xwendegehan, li nivîsgehan, li cihê kar, li komela û derê be. Gelek malbat guhê xwe didine kesê xemgîn û şînî, diberdilê wan didin û ji wanre dibin stûna palê xwe bidnê.  Û gelek amadene dost û merviê xwe ji devera zemînhejê li mala xwe bi cîhbikin.

Ez ji dilê xwe, spasî hemû mirovên arîkariyê dikin, dikim. Mirovahî û insanetiya we, ronahiyeke di van demên tarîde! Hesta we hêzê û hêviyê û baweriyê dide!

Li bakur rojavayî Sûriyê hê gelek mirov libandî arîkariyêne. Başe go Hevgirtina Miletan vêga li wê deverê ye û go ji xwere rêvedikin, jiboyî bigîjne kesê dibin ax û xaniyade mane û go çarê xwe dikin, arîkariyê bibne wê devera, go pêwîstieke gelek pêheye. Ez îro jî bangewazê bi taybet li Rêbarê siyaseta Sûriyê dikim: Rê bidin go jin û zilamên arîkarbin, kare xweyê, jiboyî rizgarkirina jiyanê, bikin! Mafê çikesî û tukesî tine rê li arîkariya mirovahî bigre!

Ji mere zelal e: Arîkariya me vêga ji mirovê li devera zemînhejê re pêwîste. Û dûre jî wê pêwîstiya wan bi arîkariya me hebe. Kî bibîne çend wêran û kavil bûye, ewê zanibe, go wê demeke dirêj pêwîstbe, heta ew

kesê zindî ji vê malwêranî xelasbûn e, bi berdewamî bê tiştê pêdewîst bêne careserkirin.

Tiştê go vêga ji mere pêwîsta, piştgêrî berdewambe. Hesta mirovahî her pêwîste û wê ji wan re pêwîst be, go wênê malwêraniyê liberçava nemînin û dengûbasne dine girin cihê wan bigrin. Herkes kare arîkarbe, hin hindik û hin gelek. Hin bi kare praktîk, hin bê piştgirtina madî. Ya ji hemûyî girinttir ewe, em bikin. Em bihevre bikin. Almanya welatê me hemûwa ji were amadeye!

Ez îro li virim, em îro li virin, joboyî pêşanî hemû mervên pêwendîdarên vê malwêraniyê bidin: Em li tanişta wene. Û emê li tenşta we bimînin.

Biz her zaman yanınızdayız.

Nabqa bi-janibikum.

Emê li cem we bin.